
# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (275):

## Dijatiyek li ser temenmezinekî û îşkencekirina sivîlina, revandin li "Be'irava", girtinine bêsûcane, gundine niştecîkirinê, qutkirina hirşê "Qitmê", geregoşî û dizîn

















موقع مزار قازقلي- جنديرس
أرض قرية "دنيز فناري" الاستيطانية
قرية استيطانية
قرية استيطانية


Deniz Feneri


قرية "دنيز فناري" الاستيطانية، موقع مزار قازقلي- جنديرس
23/1/2024


GLOBAL
SHELTERS
CONSTRUCTION PROJECT
SYRIA
SHELTERS
CONSTRUCTION PROJECT
SYRIA


NORTH


NORTH


NORTH
عفرين - شمالي حلب
المملكة العربية السعودية
KINGDOM OF SAUDI ARABIA
مركز الملك سلمان للإغاثة والأعمال الإنسانية
KING SALMAN HUMANITARIAN AID & RELIEF CENTRE
مشروع قرية الخزامى
للأشقاء السوريين المتضررين من الزلزال
1500 وحدة سكنية
مدرسة
مسجد
مستوصف
20 مرفقا اجتماعيا
15 ملعب أطفال


NORTH
عفرين - شمالي حلب


الدكتور خالد عبد ربه
الشيخ خليل عميرة






افتتاح مشروع "أرض الأمل 2"، عفرين، 4/5/2023م
NORTH
قرية مور باهر القدس


NORTH
قرية بيت حنينا







Binpêkirin û tewan di dermafê Kurdan û herêma wan de -bê ku gundek jê were awertekirin- berdewam in, û rengekî rêbazkirî distînin, ji ber ku bi şêwakî berdewam û fere ji şeş salên Dagîrkeriya Turkiyê ve tê pêkanîn, ji aliyê hemî Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ve, bi serpereştiya Istîxbaratên Turkiyê û di bin çavên destlatên dagîrkeriyê yên leşkerî û rêvebirî û saziyên/dezgehên wê de, bê ku yên dikin -ji bilî hindikan jê- werin dadgehkirin an jî sezakirin.

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Dijatiyek li ser temenmezinekî:**

Li 21.01.2024an. Z, giropeke perwerdekarên pêz ji anîndeyan mekin bi çoyan/çovan li temenmezin "**Umer Ehmed Elo**" ji xelkê Gundê "Berkaşê" - Navça Bilbilê xistin, ji ber wê jî ji bo dermankirina birînên wî rakirin nexweşxanakê li Efrînê; Ew jî piştî daxwazkirina wî derxistina keriyekî pêz ji zeviyeke wî ye zeytûna, û berê jî ew û kurê xwe rastî hin dijatiyan hatibûn; Û divê bê zanîn ku Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" gund desteser dikin.

**= Giropa çeteyên revandinê li Gundê "Be'irava":**

Li şeva Duşemê/Sêşemê 16.01.2024an. Z, /16/ makînan ji endamên Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" biryargeha leşkerî (Mala koçberbûyê zorane Ebid El'rehman Şêxo) ya Milîseyên

"Firqit El'sultan Mûrad - serkêşê wê Fehîm Îse" - perçê "Erabe Idrîs" li Gundê "Be'irava/Elîbaza" - Navça Şera basmîş kir, û berpirsiyarê gund "Ebû Mihemed El'esmer" û şeş ji giropa wî girtin, da ku Endezyar "**Şêxo Cemîl Hac Ehmed Zade** - 1964. Z" ji xelkê Gundê "Zêtûnakê" - Navça Şera ji nav lepên wan derxin; Ê ku li 29.09.2023an. Z li dor Gundê "Gemrûkê" hatiye revandin.

Û bi dozê ve girêdayî, "asayêşê" herdu merivên wî "**Şêx Se'îd Şêx Isma'îl Zade kurê Ehmed, Ciwan Şêx Isma'îl Zade kurê Ehmed**" -ên ku li 19.12.2023an. Z hatine girtin- berdan, û berê jî -piştî du rojan ji girtina wê tevî xwîşk û hevjînê wê li 19.12.2023an. Z- meriva wî "**Mewlîde Ebid El'henan Şêx Isma'îl Zade**" berda/terk kir, lê mêrê wê/hevjîn "**Ebid El'kerîm Yûnês** (ê Tûnisî û berê jî da'işî û yek ji endamên Milîseyên Ceyş El'nuxbe yên ku G. Zêtûnakê desteser dikin") û xwîşk "**Necla'i Ebid El'henan Şêx Isma'îl Zade**" li ba xwe girtî hîştin.

Û ji wêneyeke kesê hatiye revandin e piştî berdanê, û perçevîdiyoke belavkirî ye ku revandiyan di demeke berê de ji xwediyan re şandibû, asta işkencekirina ku rastê hatiye xuya dibe.

Û jêdereke xwecihî tekez kir ku Istîxbaratên Turkiyê guhdaneke taybet dan doseya revandina "**Şêxo Zade**", û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" û hin din vêrgiyine diravî beramberî "xizmetên ku di piroseya rizgarkirinê de pêşkêş kirine" -li gor ew dibêjin- ji malbatê wergirtin; Û bê ku ew aliyina bi awakî fermî hûrguliyên piroseyê û sedemên revandinê û yên di ber de berpirsiyar bidin ragîhandin.

Û ji aliyekî din ve, hin endamên "El'mûrad" tevî malbatên xwe ji Gundê "Be'irava" reviyan, û berpirsiyarê leşkerî (yê ku li vê dawiyê hatiye binavkirin) soza rêdana vegerandinê da her yekê/yekî ji xelkê gund dixweze vegere.

Û li gund ji bilî/11/malbatan ji reseniya dora/100/malbatî tune bûn, bi sedema koçberkirina zorane û qedexekirina vegerandina/10/malbatan (ên ku neçar bûne ku li Bajarê Efrînê û gundên wê rûnin), piştî ku Milîseyên "El'mûrad" li sala 2018an. Z ew desteser kiriye, û binpêkirin û tewan di dermafê xelkê wê de pêk anîne, li dirêjiya şeş salên borî.

**= Girtinine bêsûcane:**

**Bi tuhmetên têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, destlatên dagîrkeriyê ev girtin:**

**-** Li 13.10.2023an. Z, Xort "**Nezmî Mihemed Hesen** /19/sal" ji xelkê Gundê "Anqelê" - Navça Şiyê, piştî vegera wî ji ciyê penaberiyê Heleb bo gundê xwe, û ta niha li ba Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" bêsûc bendkirî ye.

**-** Li 27.12.2023an. Z, Hemwelatî "**Delîl Mistefa Mistefa**/Malbata Keşo/35/ sal û hevjîna wî **Ferîde Fadêl Îbrahîm**/31/sal û herdu zaroyên wan ên biçûk" ji xelkê Gundê "Firfirkê Jorin" - Navça Reco û li Bajarê Efrînê rûniştî, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" ve, li dema seredana wan ji merivên xwe re li Reco û li dû fisûkiyeke kîndar li dijî wan; Û li 16.01.2024an. Z jin û herdu zaro -piştî ferzkirina vêrgiyine diravî li ser wan- hatin berdan, lê mêr rastî îşkencekirinê hat, û ta niha zorane veşartî ye û çarenûs nediyar e.

**-** Li 13.01.2024an. Z, Hemwelatî "**Ednan Mihemed Xelîl**/Malbata Sito /45/sal - makînês kar dike" ji xelkê Gundê "Ebûdanê" - Navça Bilbilê, ji aliyê "Asayêşa Leşkerî li Ezazê" ve, û du heftan -bê ku bi cîhana derve re têkildar be- ma, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

**-** Ji xelkê Gundê "Goliyê Jêrin" - Navça Reco, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" ve, li 14.01.2024an. Z Hemwelatî "**Rihanê Yûsêf keça Mihemed Elî** /50/ sal, **Elî Silêman kurê Mehmûd** /35/sal, **Fatîme Silêman keça Mihemed Elî** /51/sal", li 23.01.2024an. Z Hemwelatî "**Mihemed Silêman kurê Mehmûd** /53/sal, **Mistefa Mihemed Bekir** /33/sal", û li 24.01.2024an. Z Hemwelatî "**Xelîl Ibrahîm Bîlal** /66/sal - nimêjvanê/îmamê mizgeftê"; Û berê jî li 29.12.2023an. Z ji gund du keçên xwîşk "**Zêneb** /21/sal û **Henîfe** /20/sal - **keçên Silêmên**" girtin, da ku hejmara jinan bigihêje /4/an; Û ta niha her /8/ bêsûcane girtî ne.

**-** Li 17.01.2024an. Z, keçik "**Lem'an Reşîd Seydo** /35/sal" ji xelkê Gundê "Metîna" ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Şera" ve, piştî neçarbûna wê ji bêtirî heyvekê ve ku ji ciyê penaberiyê Heleb vegere gundê xwe da ku xizmet dê û bavê xwe yên temenmezin û di mala xwe de rûniştine bike, û ta

niha bêsûcane bendkirî ye, bi ser ku wê /1700/ Dolar Emrîkî jî dabûn Milîsyên "Firqit El'sultan Mûrad" ên ku gund desteser dikin.

**-** Li 16.01.2024an. Z, Temenmezin"**Almase Onbaşî** /65/sal - hevjîna Umer Birîm" ji xelkê Gundê "Hecîka" - Navça Reco, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" ve, ya ku li dawiya Havîna borî ji ciyê penaberiyê Heleb vegeriye gundê xwe, û bo Hepsa "Maratê" - Navenda Efrînê hate şandin.

**-** Li 18.01.2024an. Z, Hemwelatî "**Ebdo Reşîd Henan Hac Ebdo** /45/sal" ji xelkê Gundê "Qestelê Xidriya" - Navça Bilbilê, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Ezazê" ve, li dema ku çûye bajêr, û ta niha bêsûcane girtî ye.

**-** Li 23.01.2024an. Z, Hemwelatî "**Elî Umer Mihemed** /70/sal" ji xelkê Gundê "Elemdara" - Navça Reco (yê ku tevî hevjîna xwe bi tenê rûniştine), ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û "Asayêşa Leşkerî li Reco" ve, bi behaneya ku keça wî "Nûra" (ya ku li sala 1987an. Z şehîd ketiye - yanê ji berî /37/salan) di nav refên Partiya Karkirên Kurdistanê(PKK)de bû, û ta niha "Elî" bêsûcane girtî ye.

**= Gundine niştecîkirinê yen nû:**

Bi behaneya bicîkirina yên ji Erdheja /6/ ê Reşmehê 2023an. Z ziyan dîtine û nişteciyên resen jî ne di nav de, avakirina gundên niştecîkirinê yên nimûneyî ji bo niştecîkirina anîndeyên parêzgehên Sûrî yên din li herêmê hate lezandin, weke xizmet ji piroseya guhertina endeza demografî re, ya ku Turkiyê bi hûrgulînî li ser kar dike:

**- Gundê "El'selam/aştiyê":**

Li 23.01.2024an. Z, "**Rikxirawa/rêxistina Oranc - Organition Orancê**, ya rêdankirî/ruxsetkirî li Turkiyê û nivîsgeheke wê li Bajarê Entabê heye" Gundê "**El'selam/aştiyê**" di nav hirşê "Qitmê" - Navça Şera de vekir, ê ku ji /315/ yekîneyên rûniştinê (mîna malên pêşinde avakirî) pêk tê, tevî cîbicîkirina binevahiyeke/binesaziyeke tevahî ji rê, xerckirina ava şuştinveşuştinê, toreya ava hundirîn ji her yekîneyekê re, taqeta royê, amûrên elektirîkê bi tevahî û mizgeftekê, û hejmara yên tê de hatine niştecîkirin gihîşte dora/1384/nişteyî ji anîndeyan.

Herweha Rikxirawa/Komela "Buhar" jî li heyva Cotmehê 2023an. Z /775/ konên pêşxistî (RHU) ji dora /650/malbatî re ji anîndeyan di çadirgeha hirşê "Qitmê" de venan; Û li wir sê çadirgeh (Jorin, Jêrin, Me'iseran) hene.

**- Gundê "Deniz Fenerî":**

Li 23.01.2024an. Z, Komela "**Minara Deryayê - Deniz Fenerî**" ya Turkiyê -navnîşana wê "Zeytûn Borno - Istanbûl"- vekirina Gundê "**Minara Deryayê/Deniz Fenerî**" ragihand, ê ku bi hevkariya "**Saziya Rehmê ya Cîhanî - Global Rahmah Foundatin (GRF)**" - Bajarê "Manşêstir a Birêtanî" hatiye avakirin, û ji /200/malî bi biloka û çîmento pêk tê, tevî binevahiyan/binesaziyan û mizgeft û dibistan û amojgeheke olî, û li ser erdekî rûbera wî dora/4/hiktaran, piştî jiholêrakirina darên îhracê li cîgeha Zaretgeha "Qaziqlî" - Navça Cindirêsê.

**- Gundê "El'xozame":**

Li Havîna 2023an. Z, **Rikxirawa/Rêxistina "Afad" (Desteya xişimûbêtar û awerteyên Turkiyê)** cîbicîkirina pirojeya Gundê "**El'xozame**" li nêzîk Gundê "Xezîwê" - Şêrewa bi dawî kir, ê ku ji /1500/yekîneyên niştekirinê/kerevane û tevî kişandina elektirîkê û toreya ava vexwarinê pêk tê, herweha jî dibistan û mizgeft û dermankiringehekê/mistewsef, avahiyên xizmetguzariyên civakî û riyan û ronîkirina kolanan, û tev jî bi pereyên "**Navenda Qeral Selman a Fîxan û Karên Mirovahiyê ya Si'ûdî**".

**- Du gundên "Sor Bahêr, Beyt Henîne":**

Me di "rapora xwe /244/ de - 06.05.2023an. Z" li ser vekirina "**Gundê Hêvî 2/El'emel 2**" yê niştecîkirinê yê nimûneyî (yê ku ji aliyê "**Desteya Cîhanî ya Fîxan û Geşepêdanê/Unsir**" hatibû avakirin, li nêzîk Çandingeha"Gobelê"ya girêdayî Gundê "Cilbirê" Robariya, li 04.05.2023an. Z) nivîsand; Lê bi şopandinê re xuya bû ku pirojeya bi navê "**Erdê Hêvî 2/El'emel 2**" du gund bi navê "**Sor Bahêr, Beyt Henîne**" (yên vedigerin Gundên Sor Bahêr - Başûr Rojhilatê Bajarê Qudsê, Beyt Henîne - Bakurê Bajarê Qudsê) li ser hatine

avakirin, ên ku xelkê wan herdu gundên Felestînî alîkariya peran dane ji bo avakirinê li Efrînê, û "**Şêx Xelîl Umeyre û Dr. Xalêd Ebid Rebo** - nûnerên herdu gundên Felestînî" jî li şahiya vekirinê beşdar bûn.

**= Qutkirina hirşê "Qitmê":**

Li gor jêderine xwecihî û perçevîdiyon belavkirî, tê xuyakirin ku hirşê Gundê "**Qitmê**" - Navça Şera ji bo êzingkirin û bazirganiyê rastî qutkirineke fere hatiye, û tê de çadirgehin/kampin ji anîndeyan re hatine avakirin, û bi beramberkirina di navêna du wêneyan de ( yên ji tevahiya hirş re hatine girtin), ji aliyê "Gogêl Êrs" ve, û bi du dîrokan (04.06.2018an. Z berî qutkirinê, 31.12.2022an. Z), tê xuyan ku rûberin fere dora /70/hiktarî di navboriya çar demsalên Zivistanê de hatine qirkirin, û weha jî dora/17/hiktaran jî li Zivistana îsal, yanê tev de dora **(87 hiktaran=/87/hezar darî îhracê (yên sinoberê - temen jî bêtirî çel salî)**, û ta niha piroseyên qutkirinê berdewam in; Û herweha jî ji ber xemsarî yan jî bi mebest agir pêketin, ji bo li ser qutkirinê were peçinandin.

Niha jî gund û hirş di bin desteseriya Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" - perçê "**Erabe Idrîs**" de ne, yên ku ketine şûna Milîseyên "Eniya/El'cebhe El'şamiyê", piştî qewtandina wan ji Efrînê li Cotmeha 2022an. Z.

Û tê bîranîn ku "Erabe" kurê birayê "Selîm Idrîs - Wezîrê/Şalyarê Berevaniya Hikometa Sûrî ya Demkî a berê" ye, ji Bajaroka "El'mubarkiyê" - Gundewarê Humsê ye, û di bin destê wî de "**Hemade El'zihorî**" kar dike, yê ku ji Bajaroka "Qisêr" - Gundewarê Humsê ye, berpirsiyarê biryargeha leşkerî li "navenda îhracê ya berê li derbasgeha Gundê Qurtqilaqê" ye, stubariyên qutkirin û qirkirina daristanên îhracê li herdu gundên "Qurtqilaqê û Keferomê" (yên bi "Qitmê" re hevcîwar) li xwe digirtin, û ta niha jî di qurkirina daristanin din de berdewam e, bi ser de jî bikaranîna binpêkirinan di dermafê xelkê wan gundan de, û îşkencekirina revandber û girtiyan di wê biryargehê de.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

- Li 15.01.2024an. Z, giropeke çekdar bi makînak cîp "Santafê" (bi nimrak leşkerî 30582 e Artêşa Niştîmanî ya Sûrî - li gor kenalin ragîhandinî yen xwecihî û jê re alîgir) êriş rêbendeke leşkerî ye Milîseyên "Tevgera Rizgarkirin û Avakirinê/Herekit El'tehrîr we El'bîna'i" li Gundê "Tiltewîlê" - Bakur Rojavayê Bajarê Efrînê kir, û di encamê de (sê endam hatin kuştin û pênc jî birîndar ketin - li gor heman kenalan).

**= Binpêkirinine din:**

**-** Li 12.01.2024an. Z, Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" herdu hemwelatî (**Ebdo Ehmed Necar** /40/sal - ê Keya/mixtar, **Ibrahîm Mihemed Ebdo** /45/sal ji xelkê Gundê "Kurzêlê"- Şêrewa) daxwaz navenda xwe li gund kirin, û li wan xistin û îşkence kirin, li dû nerazîbûna her yekî ji wan ji dandina vêrgiya /5/hezar Dolar re, bi behaneya rêvebirina wan bi rêdankan/wekaletan ji erdên merivên xwe re, û mixtar (ê ku neçar bûye ku ji ber îşkencekirinê xwe li cem bijîşkekî derman bike) bi şev berda, "Ebdo" jî piştî du rojan, û herdu jî neçar kirin ku peran bidin.

**-** Di navboriya deh rojên dawiyê de, dizin/çeten çekdar ji Giropa "**Ebû Diyab/Harêm**" ji Milîseyên "Firqit El'hemzat" (/13/teneke zêtê zeytûna yên /16/KG sade ji bin avahiya Mala "Mihemed Ebdo" dizîn, du betariyên taqeta royê ji Mala "Mistefa Mûrad", matorek dutekerî ji pêş Mala "Yûsêf Bekir", matora duloqî ya "Nêçîrvan Hacî", çar mî tevî berxikên wan ên "Ehmed Hacî") ji xelkê Gundê "Maratê" - B. Efrînê dizîn.

Bi bûyîn û nîşandayînan emê rastiya kiryar û siyasetên dijayetiyê yên derbarî Efrînê û xelkê wê de têne meşandin aşkere bikin, û berpisiyartiya Turkiyê di ber de dimîne bingehîn, û ew çarçewên "rikberiya siyasî û milîseyî" (yên ku dest danîne ser Efrînê û navçên wê) tenê bi dest de acet in.

28.01.2024. Z

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Dijîkirin li ser temenmezin "Umer Ehmed Elo", 21.01.2024. Z.

**-** Îşkencekirina "Şêxo Cemîl Hac Ehmed Zade" yê hatiye revandin.

- "Erabe Idrîs" serkêşekî Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" û yê di bin fermana wî de kar dike "Ebû Mihemed El'esmer" - berpirsiyarê Gundê "Be'irava/Elîbaza" yê leşkerî.
- Hemwelatiyên girtî "Delîl Mistefa Mistefa/Malbata Keşo/35/sal û hevjîna wî Ferîde Fadêl Ibrahîm/31/sal û herdu zaroyên wan ên biçûk" ji xelkê Gundê "Firfirkê Jorin" - Navça Reco.
- Gundê "Aştiyê/El'selam" yê niştecîkirinê li hirşê "Qitmê" - Navça Şera.
- Gundê "Deniz Fenerî" yê niştecîkirinê li cîgeha Zaretgeha "Qaziqlî" - Navça Cindirêsê.
- Gundê "El'xuzame" yê niştecîkirinê li nêzîk Gundê "Xezîwê" - Şêrewa.
- Pirojeya "Erd El'emel2"/herdu gundên "Sor Bahêr, Beyt Henîne" yên niştecîkirinê li nêzîk Çandingeha "Gobelê"/Gundê "Cilbirê" - Robariya.
- Hirşê "Qitmê" - Navça Şera, berî û piştî qutkirinê.
- "Erabe Idrîs" û yê ku di bin destê wî de kar dike "Hemade El'zihorî" - berpirsiyarê Gundê "Qurtqilaqê" - Navça Şera yê leşkerî.